



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 44

Şopên Hûriyan di Kelepora Rojhilata Navîn û Cîhanî da (beşê yekem)

Destpêk:

Bi me ra derbas bû ku hên ji dawîya hezarsala sêhem b.z. da piraniya pêşiyên Kurdan bi navên wek (*Hûrî = Horî = Xûrî = Xûrî = Sûrî*) li gor navê rojê (*hûr = xûr = sûr*) û li gor xwedayê rojê (*Ahûra = Asûra = Aşûra = Sûryaş*) hatine naskirin. Navê wan di jêderên erebî da bi şêwazê (*Ĥûrî*) (حوري) belav bûye. Bi herhal, ev ji kelepora Îbranî hatiye wergirtin; ji ber ku ev nav di pirtûka îbranî pîroz da (Heyama Kevin) bi vî şêwazî hatiye¹.

Dîsa bi me ra derbas bû ku *Hûrî* li Asiya Biçûk rûniştibûn û herweha li Sûriyayê jî bi hejmareka gelek bilind hebûn. Dr. Ehmed Hibbo, mamostayê zimanên samî li zanîngeha Helebê, dibêje ku nijadê hûrî di wê demê da "**beşekî ne biçûk ji gelha Sûriyayê bi giştî pêkdianî**"².

Hin êl û malbatên Hûriyan li Filestîn û başûrê Urdinê jî rûniştibûn. Dîrokzan Wilhelm Gernot dibêje: "**Hûrî li dor dawîya hezarsala sêhem b.z. ji herêmên çiyayî yên bakur-rojhilatê Mêzopotamiya hatine û ketine bin bandora şaristaniya sûmerî-akkadî, û di nîveka hezarsala duwem b.z. da roleka girîng di gihandina şaristaniyê da bo Sûriyayê û Asiya Biçûk leyîstine**"³.

Emê niha bi kurtahî hin bandorên çanda *hûrî* di çandên rojavayê Asiyayê da bi taybetî bidin xuyakirin. Divêt bête zanîn ku çandên rojavayê Asiyayê piştî wê bi rêya Cihûtî, Kirîstiyani û Îslametiye li seranserê Rojhilata Navîn û cîhanê belav bûne. Divêt herdem li bîra me be ku çanda *hûrî* di bîngeha xwe da çandeka rojeyî (şemsanî) ye; sembola wê ya pîroz roje.

Hin embaz (model) ji bandora çanda hûrî:

- **Xwedawend Teşşûp (Tishshup):** Ev mezinê xwedawendên *Hûriyan* bû; ew xwedayê baran û birûskê ye û li bajarê Ûgarêt, li ser kenara Derya sipî bû. Ew li Sûriyayê bi navê (*Ĥeded = Heded = Adad*) (حَدَد = هَدَد = أَدَاد) dihate naskirin. Wisa tê xuyakirin ku ev nav ji taybetmendiya wî bû. Ev di zimanê kurdî da tê maneya (dad, dadmend, dayende). Ji bo wî perestgeheka mezin û navdar li bajarê Helebê hebû. Dibe ku ew perestgeh be, ya ku di keleha Helebê da hate vedîtin⁴. Hin xwedawendên *pantheona hittî* jî di bîngehê da *hûrî* bûn⁵.




Xwedawend Tishshup bi kopiya xwe ya hittîfî

- Lexema (**Îblîs / Şeytan**): Di mîtolojiya *hûrî* da ji dêlîndêzên dûrxistina mirov ji bîmarî û nexweşîyan ra (**Nukkeşî**) digotin. Ev nav dişibihe peyva kurdî (nexweşî, nexoşî), yanê nexweşîya neçê. Di wê demê da oldarê *hûrî* sê tilûr (teyr) dianîn, hemû gunhên gel diavêtin ser wan, ew dikirin qurban û ji dêla gel va ew dişandin cîhana jêrîn (dojehê)⁶.

Li ba Îbranan ji dêlîndêza paqijyê ra digotin (**nêriyê gunehkariyê**) yan jî (**gayê gunehkariyê**). Oldarê Îbranî hemû gunehên gel diavêtin ser wî; ew serjêdikir yan jî berdida çol û beriyê. Piştî wê, ev dêlîndêz guherî û bû "*berxê qurbanê*" di çîroka pêximber Îbrahîm û kurê wî Îshaq da, li gor gotûbêja tewratî. Wisa tê xuyakirin ku dêlîndêza "**Nukkeşî**" di bingehê da baweriya bi hebûna heyberêkî şerxwaze (*Ahrîman / Îblîs*) di Zerdeştî, Cihûtî, Kirîstiyaniyê û Îslametiye da. Dibe ku ev lexem di kelepora kirîstiyaniyê da guherî be û bûbe (*Şeytan*) û ji wir ketibe kelepora erebî. Bi herhal, lexema (*Şîtan*) - li gor bilêvkirina gelêrî misirî - ji navê xwedawendê şer yê misirî (*Sît*) hên ji dema pêş Kirîstiyaniyê hatiye (bi inglîzî "*Seth*"). Wek tê zanîn, Misir landika geşbûna xwedawendiya Kirîstiyaniyê bû li tenîşt Filtestîne û Asiya Biçûk⁷.

- Lexema (**Beg**): Navê xwedawendekî ji xwedawendên *Hûriyan* "**Baga**" bû û navê padîşahê *hûrî* (**Begok**) ji navê vî xwedawendî hatibû wergirtin. Ev xwedawend li ba *Kaşşîyan* (xizimên *Hûriyan*) jî naskirî bû. *Kaşşîyan* perestina vî xwedawendî bi navê xwedawend (*Bugaş*) xistin Mêzopotamiya; dema ku di navbera (1531 - 1157 b.z.) li wê herêmê desthilatdar bûn. Ji navê vî xwedawendî navê bajarê (**Baga Dad = Beg Dad = Bexdad**) yan jî (**Beg da = Bex da**) **Bexda**; yanê diyariya xweda **Bag** hatiye. Dema ku Ereben Misilman di nîveka sedsala heftan z. da welatê Îraqê talankirin Bexdad gundekî biçûk bû û bazar lê hebû. Bi herhal, bi derbasbûna sedsalan û paşketina mîtolojiya *hûrî*, navê xwedawend (*Baga*) di kelepora kurdî da guherî û bû lexema (*Beg*) ji bo bilindkirina nîrxê mirov û di heyama Osmanî da belav bû⁸.



Xedawenda şer ya misirî Sît

- **Adem - bavê mirovatiyê (Adamma):** Ev jî navê xwedawendekî Hûriyan bû⁹. Em dûr nabînin ku peywendiya vî navî bi **çiroka Adem** bavê mirovatiyê ra hebe. Li gor gotûbêja tewratî herêma (bihuşta Aden) ku Xweda di wê da Adem û Hewa afirandibû li welatê *Hûriyan*, li nêziya çavkaniyên Dijle û Ferat bû. Di Tewratê da hatiye: {Xweda li rojhilat bihuştek li Aden çand û Ademê ku afirandibû xiste nava wê. Xweda di erdê da her dareka ku çavên mirov dikişîne û çêja wê xweşe çand û gihand} {وَعَرَسَ الرَّبُّ إِلَهُ جَنَّةً فِي عَدْنٍ شَرْقًا، وَوَضَعَ هُنَاكَ آدَمَ الَّذِي جَبَلَهُ. وَأَنْبَتَ الرَّبُّ إِلَهُ مِنَ الْأَرْضِ كُلَّ شَجَرَةٍ شَهِيَّةٍ} {لِلنَّظَرِ وَجِدَّةٍ لِلْأَكْلِ¹⁰.

Di mîtolojiya sûmerî da hatiye ku xwedawendên **Anunnaki** hemû astên serwerî di destên xwe da hiştibûn û karên giran û bi cefa kiribûn para xwedawendên **Igigi**. Piştî pir salan di vê rewşê da, xwedawendên **Igigi** li dijî **Enlil**, mezinê xwedawendên **Anunnaki**, serî hildan. Hîngê **Enlil** ferman da ku heyberekî mirovî bê afirandin daku li cihê xwedawendên **Igigi** bi van karên giran rabin. Bi sûmerî nav li vî heyberê nû kirin (**Lu Lu**) û **Ademu**. Îbraniyan ev nav bi şêwazê **Adma** wergirtin û bi şêwazê **Adem** kete kelepora îslamî. Me berê nîşan bi wê yekê dabû ku (*Sûmerî - Sûbarî - Hûrî / Sûrî*) hemû di bingehê da vedigerin ser yek erdnîgarî û çanda hevbeş¹¹.

- **Hewa dayîka mirovatiyê:** Xwedawendeka **Hûriyan** hebû jêra (*Hepat, Xepat*) û herwisa (*Hebat*) û (*Hibat*) digotin. Ew xwedawenda rojê û kebanîya xwedawend **Tishshup** bû. Ev nav bû beşek ji navê hin dotmîrên *Hûrî-Mittaniyan*. Ji wan, herdu dotmîrên *Mittaniyan* ku bi Fer'ewnên Misirê ra şû bûbûn (zewicî bûn); ew jî (**Gilo - Hîpa**) û **Tadu - Hepa**) bûn. Ev nav bi şêwazê (*Hipat*) yan jî (*Heywat*), yanê xwedawenda dayîk hatiye. Îbraniyan ji dema pêximber Îbrahîm da ew wek dayîka gewre ji bo hemû mirovatiyê hejmartine. Bi rêya Îbraniyan navê wê bi şêwazê (*Hêwa*) (حواء) kete kelepora îslamî¹².



Wêneyê padîshahekê ku bawer dikin ew nîşana xwedawend Xepate

- **Lexema (Xirîst):** Şêwazê inglîzî ji peyva (xirîst) ra (Christ)-e û tê maneya (*mesîh, lêhîştin*), yanî bi zeyta pîroz hatiye lêhîştin. Ev dêlîndêza tahrîl di mîtologiya piraniya gelên herêma Derya Sipî da heye; bi taybetî jî li rojavayê Asiyayê. Ev peyv vedigere ser peyva yûnanî (Χριστός). Hêjayî gotinê ye ku em bêjin: Ev peyv bi nîşandana Kirîstiyaniyê (Christianity) û Kirîstan (Christian) cara pêşîn li bajarê Entekê (Intakiya) hatiye xuyakirin. Ev bajar di wan herêman da bû ku çanda hûrî (şemsanî / mîtrayî) bi çanda ewropayî Helenî (Hellenic culture) ra li rojavayê Asiyayê tevlihev bûbû.

Ji lew ra, em dibînin, bi herhal, rahê navê (xirîstû) vedigere ser navê (*Hûrî = Xûrî = Xurî*). Bi me ra derbas bû ku Mîtra (xwedayê rojê) ji xwedawendên here gewre bû li ba Mîttaniyan û yek li lexemên wî (*Mesîh*) bû, yanê rizgarkerê mirovatiyê ji gunehên mezin ([vegere ser lêkolîna me. Peywendiya navbera Mîtrayî û Kirîstiyaniyê di vî lînkî da: https://app.box.com/s/782bdr43x6ynxz4rvvw02jnek2d6w26r](https://app.box.com/s/782bdr43x6ynxz4rvvw02jnek2d6w26r)). Li ber ronahiya vê rastiye, tê xuyakirin ku çima di avakirina kenîştan da berê wan didin aliyê rojhilat; rûyê Kirîstiyane mirî jî, dema vedişêrin, didin rojhilat; ji ber ku derketina rojê wek sembola *birêz Îsa* û ronahiya wî têtê dîtin. Di dêlîndêza tahrîl da oldar û alîgirên wî berê xwe didin rojava, wek nîşana nepejirandina *Şeytan*. Di pey ra berê xwe didin rojhilat daku (zagona baweriyê) bixwînin. Guhartina ji rojava ber bi rojhilat nîşana guhartina ji tarîti ber bi ronahiyê ye (çifbûna Ahûra-Mezda û Ahrîman).

- **Lexema (Xûrî):** Lexema (*xûrî*), li gor têngihîştina kirîstiyaniyê, keşeyê gunde; ew ser bi keşeyê bajêre. Şêwazê latînî yê peyva (Khouri) di gelek zimanên ewropayî da wek îtalî, almanî, firansî, inglîzî, îrlandî jî tê bikaranîn. Di zimanê rûsî da bi şêwazê (Хурри) hatiye û wek (*Xûrî*) tê gotin. Di zimanê sirbî da bi şêwazê (Кхоурри) hatiye û dîsa wek (*Xûrî*) tê gotin. Wisa tê bawerkirin ku bingeha gotinê ji yûnanî hatiye (Χούρι) û bi awayê (*Xûrî*) tê gotin. Em wisa bawer dikin, ku bi herhal, Yûnanan jî ji navê (*Hûr = Xûr*) wergirtine. Tiştê ku vê yekê piştrast dike ewe ku di erebî da li gor beşkirina kirîstiyaniyê rojhilatî bi şêwazê (*Şemas*) (شَمَاس) hatiye wergerandin.

Çarşemb, 27.01.2016

Jêder

¹ Heyama Kevin, rêwîtiya Pêkhatinê, Eshah 36, ayet 20-28. Sifir El-Tasniya, Eshah 2, ayet 12.

² Ahmad Hibo: Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 242.

³ Wilhelm Gernot: Hûrî, rûpel 24.

⁴ Ahmad Hibo: Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 242.

⁵ Maurice Croissier: Dîroka şaristaniyan ya gelemper, 1/107. Wilhelm Gernot, Hûrî, rûpel 54.

⁶ Wilhelm Gernot: Hûrî, rûpel 133, 134. Fadil Abdulwahed Ali: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 154.

⁷ Heyama Kevin, Sifir Al Lawbiyin, Eshah 16, ayet 9-11, 21-22.

⁸ Komek ji lêkolîneran, Kerkûk, rûpel 169, nîşe 3.

⁹ Wilhelm Gernot: Hûrî, rûpel 107.

¹⁰ Heyama Kevin, rêwîtiya Pêkhatinê, Eshah 2, ayet 7-9, 15.

¹¹ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 191. Jems Mars: Desthilat bi nehîni, rûpel 532-533.

¹² Wilhelm Gernot: Hûrî, rûpel 107. William Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/62.